Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1206 22-Îlon-2024 www.ronahi.net/ku/

**Navnîşan**
www.ronahi.net/ku/ rojnameyaronahi @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com Rojnameya Ronahî +963 984 370 218

# Şêwekar Evîn Sedîq bi hunera xwe reng dide pêşangehan



Navenda Nûçeyan

**Şêwekar Evîn Sediq bi hunera xwe ya balkêş û modern ji bo jinên hunermend bûye mînak û di hunera xwe ya modern de 'Jin, jîngeh, civak' bi cih kiriye.**

Hunera şêwekar tê wateya nûbûna jiyanê. Jin jî di aliyê hunerê de bi fikrên xwe gelek nûbûnan çêdike, dikare komkiriyên kêrhatiyên xwe û hêza xwe birêje ser kaxezê. Bersiva hemû êş û keyfxweşiyan li gorî cîhana xwe ya hunerî dixe ser tabloyan û pêşan dide. Şêwekar Evîn Sedîq bi hunera xwe ya balkêş û modern ji bo hemû jinên hunermend bûye mînak û hunera wê ya modern di pêşnagehan de gelek balê dikşîne.

Şêwekar Evîn Sedîq di sala 1974'an de li bajarê Silêmaniyê ji dayik bûye, beşa hunera şêwekarî li peymangeha hunerên ciwan a Silêmaniyê temam kiriye. Piştre li zanîngeha Hens a Elmanyayê di aliyê hunera modern de xwendina xwe berdewam dike û 10 sal in vegeriyaye Kurdistanê, tabloya xweya yekem di sala 1999'an de nexşandiye.

**'Hunera şêwekariya modern dîrokek nû ye'**

Evîn Sedîq da zanîn ku piraniya tabloyên wê yên modern derbarê jinê deye. Destpêkê bê wênegirtinê dest pê kir û piştre dest bi hunera şêwekariyê kiriye û wiha behs kir: "Bi giştî li Rojhilata Navîn huner û werzîş bûne du faktorên ku giringî neyên dayîn. Tu deman li dibistanan nebûye mijara sereke. Di heman demê de hunermendan karê hunerî bi başî negihandine asta herî jor. Hunera şêwekarî ya modern dîrokek nûye. Di salên 40 û 50'an li Iraqê hinek hunermend çêbûn. Lê belê nikarin şêwekarî ber bi Ewropa ve bibin. Hunera şêwekarî li Rojhilata Navîn ne xwedî dîrokek serbixwe ye, lê belê nayê wê wateyê ku nebû. Tenê li ser asta dam û dezeg û akademiyên hunerê di serdemê kevin de serî hildaye."

**'Di tabloyên xwe de ez jin, jiyan û civakê dinexşînim'**

Evîn Sedîq diyarkir ku hunera wê ya yekem derbarê jinê de bûn ku hunera xwe bi awayê hunera modern pêşan da. Weke mamosteyek ya hunera şêwekar her dem karên cuda û balkêş nîşanî serdemê dide. Hewl dide hunera nû biafirîne ku bi melzemeyên taybetî çêbike û karê hunerê bi Blurî çêdike û wiha got: "Di wêneyek xwe de min çîroka xwe pêşan da, jin, jiyan û civakê dinexşîne. Divê em karên hunerê kom bikin û kar li ser çawaniya wê û armanca wê bikin. Piştre kar ji bo arşîvkirinê bikin û hilbigrin ji bo nifşên piştî me da ku ji dîroka huner û şaristaniya xwe hez bikin."

**'Divê jin di hunera xwe de îsrar bikin'**

Evîn Sedîq destnîşan kir ku bavê wê zêringir bû, karê nexşindanê dikir ev jî wisa kir ku Evîn bixwaze fêrî nexşînê bibe û bê wê riyê hezkirina wê ji wênekêşan û şêwekariyê re çêbû û wiha got: "Niha ji bo jinan di aliyê hunerê de derfetek baş hatiye afrinadin, rola wan heye û dikarin beşdarî pêşangehên hunerî bibin. Jin di aliyê jiyana civakî de, rêgirî li hêza wan a hunerî tê kirin lê belê nayê wê wateyê ku êdî dest jê berdin û li mal bimînin. Divê jin di hunera xwe de îsrar bikin û hewl bidin di fikrên cuda de xwe perwerde bikin. Jin dikarin zêdetir kar bikin, da ku bikarin beşdarî hemû qadan bibin. Daxwaza min ji jinan ew e ku xwe lawaz nebînin û girîngiyê bidin hêza xwe."**NÛJINHA**

# Tu xweş xewke, delala min!



Ji bo ku hûn rihet xew bikin,
Bi dilê xwe bilîzîn û bi panzêra neyaran neyên kuştin
Ji bo ku hûn zarokên welatê min bi dilê xwe biken in
Ji bo ku tu zarokek ji hembêza dayîka xwe qut nebe
Rêber Apo jî jîyana xwe ji boyî me hemûyan feda kir
Ji bîr mekin! ji her kesî/ê pirtir Rêber apo ji we hez dike!
Ji bo ku em tev bi hev re xewjînên bi destên xwe bihûnîn in û bijîn
Ew ên ku te serê xwe danîye ser wêneyên wan canê şêrîn dane!

# Li Dêrazorê kevneşopeke dostê jîngehê



Li gundên kantona Dêrazorê jin ji bo veguhastina baran û peydakirina pêdiviyên xwe yên rojane erebaneyan bi kar tînin û diyar dikin erebane berevajî erebeyan dostê jîngehê ne.

Li gundê Ebû Herdûb ê kantona Dêrazorê jin erebaneyan (erebeyên hespan) ji bo veguhastinê, barkişandinê û gelek karên din bi kar tînin.

Jina bi navê Hemîde El Dêf a ji heman gundî got: "Ji zêdetirî 40 salî ve em vê amûrê bi kar tînin. Li herêma me bi navê erebane tê naskirin. Kevneşopeke me ye ku pêşiyên me bi kar dianî."

Hemîde bi erebaneya ku qatir wê dikişînin, ard, êm û berhmenên çandiniyê bar dike û got: "Ev erebane barê me jinan li gund sivik dike. Ji ber ku em debara xwe ya sereke bi sewal û çandiniyê peyda dikin."

Her wiha Hemîdeyê diyar kir ku erebane dostê jîngehê ye û tevgera çûn û hatinê di nava sûkan de hêsantir dike, qerebalixê çênake, ji wê zêdetir lêçûna wê jî ne pir e, nemaze niha ku rewşa aborî û jiyanî ya piraniya malbatan dijwar bûye û nikarin lêçûna veguhastinê bidin.

Jina bi navê Xedra El Wezîr jî diyar kir ku ew ne tenê ard, berhem û semadê bi erebaneyan dikişînin, lê pê serdana xizmên xwe yên li gundên nêz jî dikin.

Bi nêrîna Xedrayê erebane ji erebeyan baştir in, ji ber ku lêçûna wan tune ye û got: "Tenê hinek êm bidin qantiran û kengî bixwazin dikarin biçin her derê."

Sudoku: Bersiv 6

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | 1 | 4 | 2 | 6 | 8 | 3 | 5 | 7 |
| 5 | 6 | 8 | 7 | 3 | 1 | 4 | 2 | 9 |
| 7 | 2 | 3 | 4 | 9 | 5 | 6 | 8 | 1 |
| 3 | 7 | 1 | 9 | 5 | 6 | 8 | 4 | 2 |
| 8 | 5 | 2 | 3 | 4 | 7 | 9 | 1 | 6 |
| 4 | 9 | 6 | 1 | 8 | 2 | 7 | 3 | 5 |
| 6 | 4 | 9 | 5 | 1 | 3 | 2 | 7 | 8 |
| 1 | 8 | 7 | 6 | 2 | 4 | 5 | 9 | 3 |
| 2 | 3 | 5 | 8 | 7 | 9 | 1 | 6 | 4 |

Sudoku:Pirs 7

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 1 | 6 | 3 | | | 9 | | 7 |
| | 4 | | | | 6 | 2 | | |
| | | 9 | | | | | | |
| 7 | | 5 | 2 | | 4 | | | 1 |
| | | 1 | | 3 | | 5 | | |
| 4 | | | 8 | | 5 | 7 | | 6 |
| | | | | | | 3 | | |
| | | 4 | 6 | | | | 8 | |
| 8 | | 7 | | | 2 | 4 | 6 | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Fala qereçiyan e:**
- Her dem rast dernakeve; rasthatin e.

**Genim e yan ce ye:**
- Baş e yan na; erênî ye, yan neyînî ye?
(Dema yek dixwaze sergirtî bersiv bê dayîn hingê tê gotin)

**Gotin, kerengê mala gangulok li kû ye, got, bablîsok dizane:**
- Ji bo kesê cî û warê wî ne diyar tê gotin.

**Ji bayê pirs bikin ew zane:**
- Bi heman wateyê.

**Kêm zêde:**
- Li wê derdorê.

Ba çawa tê bênderê wisa bide **bayê:**
- Ka keysa te çawa lê tê wisa bike; li gorî derfetan tev bigere.

**Ba çawa tê kayê wisa bide bayê:**
- Bi heman wateyê.

**Cihê qûna xwe xweş dike:**
- Keysbaz e.

**Çi li bal etar hebe wê difiroşe:**
- Her kes li gorî derfetên xwe tev digere.

**Di qorzîkeke teng de zetim/zemt kir:**
- Êdî nikare xwe jê xilas bike.

**Şekir ne xwerdê şivanan e:**
- Her kes li gorî rewşa xwe tev digere.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## PYD'ê ji bo demokratîkirina Rojhilata Navîn xeta 3'emîn e

Hevserokê PYD'ê Salih Muslim, endamê PYD'ê Mehmûd Hemê û Berdevka PYD'ê Sema Bekdaş diyar kirin ku PYD'ê dikarîbû sînorên partiyên kilasîk bişkîne û wek partiyek nûjen li gorî şert û mercên demê civakê birêxistin bike û pêşengtiyê ji sîstema hevserokatiyê re bike.**R-3**

## Dixwazin bi rêya sîxuran pergala Rêveberiya Xweser têk bibin!

Dewleta Tirk a dagirker bi hevkariya Istixbarata Parastin a Başûrê Kurdistanê û Partî Demokratî Kurdistan PDK`ê di yek sengerî de sîxuran li dijî Rojava ava dike. Şerê nasnameya gelê kurd dike.**R-4**

## 'Armanc valakirina gundê Kaxirê bû'



Şêniyan diyar kir ku sûcên li gundê Kaxirê hatine kirin beşeke biçûk a sûcên li herêmên dagirkirî ye û gotin çete bi van sûcan dixwazin gund vala bikin û malbatên xwe lê bi cih bikin.**R-5**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1206 22-Îlon-2024 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# LÊGERÊ HEQÎQETÊ Û TÊKOŞERÊ AZADIYÊ; SEYÎD EVRAN

Bîr û hafîzeya Çapemeniya Azad rojnamevan Seyîd Evran ku 30 salên xwe li çar parçeyên Kurdistanê û derveyî welat di têkoşîna azadiyê, lêgerîna heqîqetê û ragihandina rastiyan de derbas kirin, beriya salekê ji ber nexweşiya dil li Qamişlo şehîd bû. Rojnamevan û rêhevala têkoşînê ya Seyîd Evran, Stêrk Gulo da diyarkirin ku pêşengiya Seyîd Evran ji bo pêşxistina xebatên Ragihandina Azad ji nifşên nû re derfetek mezin ava kir û bû nexşerêyek.**R-5**



## Bi rêxistinbûna gelên herêmê rewşa çandiniyê û aboriya civakî tê pêşxistin



Piştî lidarxistina civîna salekê ya Komîteya Çandiniyê li Kantona Efrîn û Şehbayê, tevî êrişên rojane xebatên çandiniyê bi awayekî serkeftî bi rê ve çûn. Hevserokê Komîteya Çandiniyê Ferhad Dede diyar kir ku hemû berhemên tên bidesxistin dikevin xizmeta gel û aboriya civakî ya herêmê de.**R-6**

## Ji çiraxa huner û wêjeya kurdî



Hunermend Hojîn Hêriz xwedana dengek zelal û rûkeniyek şêrîn e. Muzîk zimanekî bê gotin e, rasterast bi dilan re diaxive bê ku li ser ramanekî bisekine û bi jenên dil re dibe yek û bi hestan re digihêje hev.**R-7**



Roja Aştiya Cîhanî û şerê cîhanî!
Ahmet Aktaş R-4



Girîngiya çandê di têkoşîna gelan de
Hafiz Ahmet Turhalli R-6



Ew dîmen hê jî li ber çavên min e!
Sîpan Şînda R-7

# Di wêjeya Kurdî de şopên têkoşîna jinan

Xwendekara beşa wêjeya Kurdî Ayfer Yildiztan li ser rola jinan a di wêjeya Kurdî de got ku di çanda civakê de gelek serpêhatiyên qewimîne hene, jinan bi riya lorîk, stran û dengbêjiyê êş û azarên civaka xwe bi hesteke hevpar a wêjeyî anîne ziman.

Wêjeya Kurdî di dîroka mirovahiyê de xwedî kevneşopiyek e. Wêjeyê bi hebûn û pêşketina mirovahiyê re dest pê kiriye. Mirovahiyê bi vê hunerê, jiyana xwe îfade kiriye. Di gavên civakî yên destpêkê de, jin xwedî roleke wisa bûne ku nirxên xwe yên pîroz parastine. Di pêşketina wêjeyê de jî bi heman rolê rabûne. Di wêjeya Kurdî ya devkî de şopên ku jinan di destan, serpêhatî û çîrokan de li pişt xwe hiştine, heta roja îro jî mane.

Ayfer Yildiztan a ku li Zanîngeha Rojava ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê beşa wêjeya Kurdî xwendiye, der barê girîngiya rola jinan a di wêjeya Kurdî de nirxandin kir.



**‘Têkiliya di navbera wêje û civakê de weke girêdana goşt û neynûkê ye’**

Ayfer Yildiztan li ser bandora wêjeya devkî, destan û çîrokên Kurdî ya li ser civaka Kurdan wiha got: “Dema ku qala wêjeyê tê kirin, yekser civak tê bîra mirov. Têkiliya di navbera wêje û civakê de weke girêdana goşt û neynûkê ye, mirov nikare herduyan ji hev cuda bigre dest. Ji bo civaka Kurd wêjeya devkî bi watetir e û girîngiya wê zêdetir e. Ji bo civakê wêje weke mertaleke parastina hebûn û nasnameyê ye û civakê diparêze. Gelek wêjevanên navdar ên weke Ehmedê Xanê ku xwedî roleke girîng in hene. Di wêjeya Kurdî de jî gelek destanên bi devkî hatine gotin hene.”

**‘Têkiliya jinan û wêjeyê bi xwezaya jinan a civakî ve girêdayî ye’**

Ayfer Yildiztan di berdewama axaftina xwe de bal kişand ser rola jinan a di wêjeya Kurdî de û wiha domand: “Mirov dikare di wêjeyê de rola jinan ji du aliyan ve bigre dest. Yek di wêjeya devkî û nivîskî de roleke çawa ji jinan re hatiye dayîn, ya duyem jî jinan bi xwe çawa wêjeyê bi pêş xistine û bi roleke çawa rabûne. Bandora wan li ser civakê hê jî diyarker e. Têkiliya jinan û wêjeyê bi xwezaya jinan a civakbûnê re bi xwezayî derdikeve pêş. Di çanda civaka Kurd de jî gelek bûyer û serpêhatiyên ku hatine jiyîn hene. Jinan bi riya lorîk, stran û dengbêjiyê ew êş û azarên civaka xwe bi hesteke hevpar a wêjeyî anîne ziman. Di çanda Kurdan de dema ku dayik zarokên radizînin ji wan re lorîkan dibêjin, zarokên ku bi van çîrokên dayikên xwe mezin dibin, bêtir bi çanda civaka xwe ve girêdayî ne û aliyê wan ê civakbûnê zêdetir li pêş e.”

**‘Ji ber ferasetên civakê jin nikarin bi îradeya xwe xebatên wêjeyî bimeşînin’**

Her wiha Ayfer Yildiztan astengiyên ku di wêjeyê de derdikevin pêşiya jinan jî wiha nirxand: “Ruxmî hemû pêşketin û pêşveçûnan jî li gelek qadan jin ji ber ferasetên civaka xwe nikarin bi awayekî azad kar û xebatên wêjeyê bidin meşandin. Nêzîkbûna ku di warê wêjeyê de ji jinan re tê raberkirin û bêbawerbûna ku civakê fêrî jinan kiriye, di warê wêjeyê de bandoreke neyînî li ser kar û xebatên wêjevanên jin jî dike. Di aliyê aborî de jî ji ber ku jin gelek pirsgirêkan dijîn, nikarin di aliyê çapkirinê de berhem û pirtûkên xwe derxin pêş û di qada wêjeyê de roleke xurt bilîzin. Ev ji aliyê nivîskaran ve jî hatiye gotin ku tişta li pêşiya jinan dibe asteng ku di qada wêjeyê de jin cih negirin, pirsgirêka aborî, siyasî û civakî ye. Wêje xebateke wisa ye lêkolînkirin, naskirina dîrokê, siyaset, erdnîgarî û divê bi awayekî giştî nêrînên mirov li ser hemû qadên zanistê hebin û têkiliyên mirov bi civakbûnê re pir xurt bin ku bikaribin berhemên wêjeyî derxin pêş.”

**‘Zayendperestî jinan ji qada wêjeyê bêpar dihêle’**

Ayfer Yildiztan di berdewama axaftina xwe de anî ziman ku zayendeperestî di qada wêjeyê de bandoreke neyînî li ser xebatên jinan dike û wiha pêde çû: “Bandora saziya malbatê û ferasetên zayendeperstiyê jinan ji xwendin û nivîsandinê bêpar dihêle. Saziya cewazê ya ku civak ewqas girîngî didê, jinan ji qada wêjeyê mehrûm dihêle. Zayendeperestiya ku îro di hemû qadên jiyanê de serwer bûye, derbasî wêjeyê jî dibe. Di gelek destanên dîrokî de jinan bi afrîneriya xwe berhemên wêjeyî li pişt xwe hiştine lê pergala heyî jin ji lêgerîna wê ya jiyana wêjeyî bêpar hiştiye. Gelek nivîskar hene di berhem û pirtûkên xwe de roleke pir xirab dane jinan, jin ne weke hebûn, weke amûreke bikaranîna pergalê didin naskirin.”

**‘Xwedîderketina li wêjeya Kurdî bi parastina ziman ve girêdayî ye’**

Ayfer Yildiztan herî dawî ji bo zimanê Kurdî jî got ku di wêjeyê de ziman xwedî roleke girîng e û wiha bi dawî kir: “Xwedîderketina li wêjeya Kurdî bi parastina ziman ve girêdayî ye. Gelek peyvên ku ji zimanê Erebî, Tirkî û Farisî li zimanê Kurdî hatine zêdekirin, di aliyê wêjeyê de jî bandoreke neyînî li ser zimanê Kurdî dike. Divê em pêşî lê bigrin û zimanê xwe yê resen bi pêş bixin. Ji ber pêşketina teknolojiyê her diçe bandoreke neyînî li ser ziman jî dike, hebûna civakê bi zimanê wê civakê watedar dibe. Ziman parçeyekî ji çanda mirov e, civakeke ku nekaribe bi zimanê xwe biaxive, civakeke ku di bingehê de rûxiya ye û her tiştê xwe ji dest daye.” **NÛ JINHA**

# Astengiyan nas nake ji bo piştgiriya xwedî pêdiviyên taybet dixebite

**Gulnaz Îbrahîm a xwedî pêdiviyên taybet ku ji Qamişlo ye, behsa çîroka têkoşîna xwe ya li hemberî astengdariyê kir û got ku baskên mirovan hene dikarin ber bi serkeftinê ve bifirin, derfetan ji jêhatiyên xwe re biafirînin.**

Dema ku mirov ji bo bidestxistina armancên xwe têdikoşe, hingê astengî bêbandor dimînin. Gulnaz Îbrahîm jineke 42 salî ye ji bajarê Qamişlo yê Kantona Cizîrê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye. Gulnaz jineke xwedî pêdiviyên taybet e, di zaroktiya xwe de ji ber şaşîtiyeke bijîşkî ji lingê xwe de kêmendam bûye. Hemû zehmetiyên ku di jiyana wê re derbas bûne ji ber rewşa wê, ji xwe re kiriye hêz û ber bi serkeftinan ve çûye.

Gulnaz berî şoreşê 3 caran bûbû şampiyona giranhêlanê ya Sûriyeyê. Heta çalakvaniya sivîl a daxwaza mafên kesên xwedî pêdiviyên taybet, her dem rêwîtiya wê berdewam kir. Gulnaz der barê serpêhatiyên xwe de ji me re axivî.

**‘Ez ji bo mafên hemû kêmendaman têdikoşim’**

Gulnaz Îbrahîm di destpêka axaftina xwe de anî ziman ku civak bi nêrîneke kêm li kesên xwedî pêdiviyên taybet dinêre û wiha pê de çû: “Difikirin ku ew nikarin tevger bikin, kar bikin an jî malbatekê ava bikin û nikarin tiştên xweş bidin civakê. Ji ber van hemû sedeman, îro ez daxwaza mafên astengdaran dikim ji ber ku ez jî yek ji wan im. Ez dizanim çiqas êş û zehmetiyan di nava civakê de dikşînin. Ji ber neqebûlkirina civakê, zehmetî duqat dibin. Em dixwazin ku civaka me were guhertin, rolekê çapemeniyê ya girîng heye di ragihandina çîrok û êşên me yên ku em dikşînin de.”

**‘Min xwe cuda didît’**

Gulnaz Îbrahîm bi xemgînî pêvajoya zaroktiya xwe ya nêrînên neyînî bibîr anî û got: “Salên destpêkê ji jiyana xwe min hîna bîr nedibir. Dema ku derbasî refên dibistanê bûm, min nas kir ku ez ne wek hevalên xwe me, wan bi gotinan ez diêşandim. Min gelek zehmetî kişand, ji ber ku di salên berê de derfet tune bûn wek roja îro.”

**Qebûlkirina kesayeta xwe û destpêkirina rêwîtiya serkeftinê**

Gulnaz Îbrahîm piştî wê pêvajoyê biryar da ku bi kesayet û rewşa xwe re lihevkirinê çêbike û dest bi têkoşîna xwe bike û wiha dibêje: “Ev rastiya min bû diviyabû li gorî wê bimeşiyama. Îsrara min zêde bû, min got gerek ez ne weke her kesê bim û ji astengdariyê hêzê çêbikim. Ez ji zanîngehê der çûm, li Şamê min di gelek komeleyên mafên xwedî pêdiviyên taybet de kar da meşandin. Gihîştim wê baweriyê ku em dikarin gelek tiştan bikin, em ne kêm jêhatî ne. Ji ber vê yekê pêwîst e cihên biryarê û civak jî rê ji van kesan re vekin da ku bikaribin tevli jiyanê bibin.”




**‘Di nava Rêveberiya Xweser de ji bo piştgiriya astengdaran xebitîm’**

Gulnaz Îbrahîm diyar kir ku Desteya Karûbarên Civakî ya Rêveberiya Xwerser a Demokratîk a herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê derfet daye ku xebata xwe bi taybetî ji bo piştgiriya kesên xwedî pêdiviyên taybet bide meşandin û wiha bi dawî kir: “Ev demek e min dest bi kar kiriye li vê derê, dibînim ku ev xebat tam li gorî peyama min e. Em jî dikarin di nava saziyan de cih bigrin. Hêviya min ew e ku her kes daxwaza mafên xwe bike.” **NÛ JINHA**



# Ji çiraxa huner û wêjeya kurdî

**Can Yûsif**

Hunermend Hojîn Hêriz Xwedana dengek zelal û rûkeniyek şêrîn. Muzîk zimanekî bê gotin e, rasterast bi dilan re diaxive bê ku li ser ramanekî bisekine û bi jenên dil re dibe yek û bi hestan re digihêje hev, muzîk zimanê kûrahiyê ye, zimanê bedewî û evînê ye, zimanê cîhanê ye ku her kes jê fêm dike, her kes pê şa dibe û di guhê mirovahiyê de yekgirtî ye.

Hunermenda Kurd Hojîn ji hunera Kurdî û mûzîka Kurdî hez kir, xwest bi hunera xwe, bi têkoşîn û dengê xwe yê xweş dengê qêrîna dayik û zarokên gelê xwe bigihîne cîhanê.

Hunermend, mamosta û pêşkêşvanê televîzyonê Hojîn Hêriz di roja 20/1/1995’an de li gundê Xenamiyê ya girêdayî bajarê Dirbêsiyê yê li Rojavayê Kurdistanê, di malbateke welatparêz û hunerî de ku bi ruhê berxwedaniya netewî û hesreta azadiyê tejî hatiye dinya yê, ji du dê û bavên Kurd (Şêxmûs û Emşa), Bavê wê, Şêxmûs Hêriz, hunermend û stranbêjekî navdare, wî jêhatîbûna keça xwe hîn di temenekî biçûk de dît û piştgiriya wê kir û ji ber vê yekê jî ji biçûkatiya xwe ve tevlî xebatên hunerî dibe.

Dibistana seretayî û navîn li gundê xwe xwendiye û ji ber evîn û hezkirina xwe ya ji bo stranbêjî û muzîka kurdî û tevlîbûna çalakiyên hunerî û çandî, xwendina xwe ya amedeyî neqedandiye, wê dest bi xwendina hunera dengbêjiyê û notasyona mûzîkê kir û tevlî dibistanên fêrbûna zimanê kurdî bû, ji bilî pêkanîna çalakiyên hunerî û çandî.



Meyla wê ya hunerî di neh saliya xwe de destpêkiriye, ew ji aliyê bavê xwe Şêxmûs ve hat keşfkirin, ku wê demê ew hunermendekî navdar bû, ew li dibistana stranbêjiyê ya bavê xwe jiya ye û şagirtî jê re kiriye û di wî warî de wî piştgiriya wê kiriye, di wê demê de wî li cem wê dengekî xurt û xweş tê de dîtiye .Wê bi beşdarbûna çend stranan li gel bavê xwe dest bi stranbêjiyê kiriye, û di sala 2008’an de bi Koma Hunerî ya Zîlan dest bi karê xwe yê hunerî kiriye û heta destpêka şoreşa Rojava û di gelek şahiyên neteweyî de stran gotine û herwiha pêşkêşvaniya şahiyên pîrozbahiyên Newrozê û çalakiyên neteweyî ên din jî kiriye. Piştre di dema şoreşê de wê di nava Tevgera Çand û Hunera Demokratîk de kar û xebatên xwe yên hunerî berdewam kiriye û xwe fêrî zimanê dayikê kiriye û di sala 2015’an de bawernameya mamostetiya zimanê Kurdî ji peymangeha Şehîd Roza cûdî wergirtiye. Di van salên dawî de armanca wê ya bingehîn ew bû ku berhemên xebatên xwe yên hunerî yê taybet biafirîne ji bo xizmeta şoreşê û gelê xwe .Xebata wê ne tenê di warê hunerî de bû, di qadên rêxistinî, meclis, komîn û ciwanan de jî kar û xebat kiriye û tevlî gelek korsên perwerde yên sîyasî,çandî û hunerî bûye ji bilî wan jî pêşkêşvaniya bernameyên televîzyonî û şahiyên neteweyî kiriye.

Hojîn Hêriz hunermend û stranbêja Kurd stêrka wê li asmanê hunerî li ser asta Rojava û hemû Kurdistanê dibiriqe, şarezayiya wê ya dengbêjiyê di temenekî biçûk de derketiye holê û bi rêya xwendin û perwerdehiyê dixebitî ji bo wê xurt bike, û Serkeftinên wê berdewam bûn û stranên wê di nav girseyên gel de navdar bûn .

Ew bi stranên xwe yên şoreşgerî, welatparêzî û romantîk navdar bû û xwedî hesteke bilind bû ku stranên wê zû bi zû diketin dilê hezkirên wê de. Hunermend Hojîn Hêriz piştî weşandina çendîn stran û vîdyo klîpên xwe yên şoreşgerî di nava şoreşê de navdar bû, wek:

1- Strana “Hesekê” ya li ser berxwedana lehengên YPG’ê li dijî DAIŞ’ê
2-Strana “Şehîd Sîal” li ser şehadeta xwişka xwe Sîal di nava refên YPJ’ê de.
3-Strana “Walato” li ser evîna welat.
4- Strana “Şehîd” li ser nirx û mezinahiya şehîdan
5- Strana “Em jinên Kurd in” li ser rola jinên Kurd di şoreşa Rojava de
6- Strana “Serê Kaniyê “ li ser berxwedana gelê Serê Kaniyê
7-Strana “Dilê Sêwî” straneke evînî û romantîk e
8-Strana “Gerîla” li ser berxwedana baz û şêrên çiyayên Kurdistanê.
9- Strana “Rojava” li ser berxwedana Rojava ya li hemberî dijminan e.

# Jiyana ku bi hunerê tê rêsandin: Stargehek û şêwaza vegotinê

**Navenda Nûçeyan**

**Sûzan Abbas li Tirbespiyê maleke hunerî vekir û hewl dide mîrateya çanda gelê Kurd zindî dihêle. Bi hunera xwe xizmeta şoreş û civakê dike; perwerdeya dilxwazî dide.**

Hunermend Sûzan Abbas jineke ciwan a ji Tirbêspiyê ye û bi îlhama ku ji dewlemendiya çanda welatê xwe digire, mezin dibe. Di zarokatiya xwe de dest bi hunera destan û wênesaziyê dike, evîna hunerê di ruhê wê de geş dibe. Sûzan Abbas bi her lêdana firçeyê hestên xwe li ser tûvalê dineqşîne û bi zimanê rengan jî kûrahiya civakê tîne ziman. Sûzan Abbas di heman demê dixwaze jêhatîbûn û karê xwe parve bike. Ew dema ku bi xwendekarên xwe re derbas dike wekî pêvajoyek fêrbûn û pêşketina bi hev re dinirxîne. Huner ji bo wê sitargehek e, şêwaza îfadekirinê ye û ya herî girîng jî jiyana wê dirust dike.

**BI XWEZAYÊ RE HUNERA XWE PÊŞ XIST**

Sûzan Abbas diyar kir ku di temenê biçûk de hunera destan û wênesazî bala wê kişandiye û wiha got: “Min di temenê xwe yê biçûk de ji her lîstika ku me dilîst berhemeke hunerî biafirînim. Ez ê diçûm gund û min simbilek genim bi xwe re dianî û min ji wê gelek berhem diafirand. Min ji kevir û daran pêlîstokan çêdikir. Ji ber ku ev aliyê min bi xwezayî pêş ket, ev bala min kişnad. Min hewl da ku vê jêhatîbûnê pêş bixim. Malbata min jî piştgirî dane min. Heger min tabloyek biçûk jî çêbikira jî wê bi dîwaran ve daliqandin û ji her kesê ku dihat malê re digot ku ew tabloyên Sûzanê ye. Bi vî awayî, xwebaweriya min zêdetir bû.”

**EW BI HUNERA XWE XIZMETA ŞOREŞÊ DIKE**

Suzan Abbas ev tişt anî ziman: “Dema min dest bi dibistanê kir, min herfên alfabeyê li ser kaxiz, dar, hêk û keviran dinivîsand, hewl dida ku wêneyên rengîn biafirînim. Min jiyana dibistanê bi hunerê derbas kir. Min hewl da ku nêrîna xwe ya li ser jiyanê bi hunerê birêsim. Ji ber vê yekê ez çûm Fakulteya Hunerên Bedew û min xwe pêş xist. Di dibistanên rejîmê de wek mamosteyê hunerê xebitîm. Piştî min zanîngeh qedand 6 meh şûnde Şoreşa Rojava pêk hat. Bi destpêkirina şoreşê re ez beşdarî saziya zimanê Kurdî bûm û 2 salan li enstîtuyê xebitîm. Ew enstîtuya ewilî ya li Tirbespiê hatibê vekirin bû. Her wiha 2 salan jî di nava xebatên Baxçeyê Zarokan de min cih girt. Ji bo pêşketina zarokan û bi çanda xwe mezin bibin me proje amade kirin. 4 saln jî li dibistanan min perwerdehî da. Bi hûrgilî li ser mijarên wekî çêkirina mufredata hunerî û çawaniya birêvebirina dersên hunerî rawestiyam, ez beşdarî çalakiyên çandî û hunerî dibûm.

Xeyala gelê Kurd ew bû ku dîrok, kevneşopî û çanda xwe zindî bihêle. Ji ber vê yekê bi hunerê re mijûl dibim. Ji ber ku ez dîroka gelê Kurd, berxwedan û têkoşîna jinê vedibêjim. Ez bi vî awayî xizmeta şoreşê dikim. Ji bo xebatên hunerî yên ku berhev kirine zêdetir pêş bixim min xaniyek hunerî ya biçûk vekir. Ez di vê hunergehê de xemlên xwe yên cuda, hunerên destan û wênesaziyê didin pêşandan. Ez hunera xwe radigihînim hunerhezan û wan perwerde dikim. Ez perwerdehiyê li ser bingeha dilxwazî dikim. Tu feydeya aborî nagihêje min. Kesê ku ez perwerdehiya hunera destan û wênesaziyê didim wî/ê hebe, ew kes jî min perwerde dike û zanyariyên xwe parve dike. Ji bo nimûne, eger şagirteka/î min hebe ku bi zimanekî din diaxive, ev şagirt min fêrî zimnê xwe dike, yan jî kesekî ku di nivîsandina çîrokan de bi Kurdî şareza be, teknîkên çîroknivîsînê fêrî min dike. Bi vî awayî ez hunera xwe hînî kesên ku dixwazin dikim û ji şagirtên xwe ferî cerebeyên nû dibim. Bi vî awayî ez dixwazim ji civakê re ragihînim ku reng û wêne ji karekî wêderitr, giyanek e.”

**HUNER RÊ NÎŞANÎ DÎROKÊ DIDE**

Sûzan Abbas anî ziman ku çand û huner beşeke girîng a jiyanê ye û wiha pêde çû:



“Ne tenê wêne her wiha folklor, şano, muzîk û hwd jî di navenda jiyanê de ne. Ev îfadeya hest û ramanên civakê ye. Huner avahiyek e ku ziman diafirîne. Di serdema ku nivîsandin hêj pêş neketiye de bi rêya wêneyan ev mîrateya çandî heta roja me hatiye. Ji ber vê yekê bingeh dîrokê avakiriye.

**‘HUNER NAVÊ CIVAKÎBÛNÊ YE JÎ’**

Divê hûn nebêjin em hunerê dikin û derbas bibin. Ji bilî hest û ramanên me, divê em bikaribin bibin xwedî ziman, deng, rengê civakê. Huner amûra civakbûnê ye. Em nikarin hunera ku civakê îfade nake weke huner bi nav bikin. Di encama piştgiriya civakê de xebatên çand û hunerê zêde bûn. Civak bêyî hunerê, huner jî bûyî civakê nabe. Em nikarin hunera ku gel xwedî lê dernekeve û xwe tê de nebîne re bibêjin huner. Her wiha divê em hişmendiya afirandina hunera civakî bilind bikin. Gelê ku bi sedsalan ji çand, huner, ziman û nasnameya xwe bêpar maye, çand û hunera ku ji aliyê jinan ve hatiye rêsandin û xemilandin hembêz kiriye.”



## Ew dîmen hê jî li ber çavên min e!

**Sîpan Şînda**

Dema ez zarok bûm, min bi xwe xwe elimand xwendin û nivîsandina Kurdî. Min korfeleqî pirtûkên Rêzimana Kurdî yên rehmetiyên Celadet û Kamîran Bedirxan li pitûkxaneyekê dîtibûn û min ew kirîbûn. Bi saya serê wan pirtûkan min xwe fêrî xwendin û nivîsandina Kurdî kir.

Di wî temenê xwe yê kiçik de, min pirtûkek bi navê Birîna Reş xwendibû. Birîna Reş, yekemîn pirtûka Kurdî ya li ser şanoyê hatî nivasandin bû ku min xwendî.

Her çend wê demê min çi tişt di derheqê şanoyê de nedizanî jî, lê belê ji bo min gelekî balkêş bû ku pirtûkek ya şanoyê bi Kurdî bixwînime. Ji ber wê hê ji navê pirtûkê li bîra min e.

Bê goman, her çend min navê nivîskarê pirtûkê jî jiber kirîbû, lê belê ji navê nivîskarî pitir navê pirtûkê li ser min bandor kiribû. Lê belê rojekê mîtînga hilbijartinên parlamenterîyê li pişta dibistana ez diçûmê çêbî. Em zarok hemî çûn seyra mîtîngê. Dema otobûsa mîtîngê hat û navê mêvanan hate xwendin û ew yek û yek çûn li ser serê otobûsê. Min dît ku navê nivîskarê pirtûka Birîna Reş ji hate xwendin. Erê, navê Mûsa Anter jî hate xwendin ji ber ku ew jî di nav wê koma hilbijartinê de bû. Bê goman kelecanê ez girtim û min got hevalên xwe “Ez vî navî nas dikime, min pirtûka wî ji beriya nihû xwendibû.” Û min hêdî hêdî di nav qelebalixê re xwe nêzîkî otobûsê kir. Dema ez çûm li ber otobûsê sekinîm, min dît ku ew ji ser otobûsê hatiye xwarê û li cihê xwe rûniştîye. Wî li camê re seyra gel dikir. Ez çûm li hinda wî sekinîm û min destê xwe ji wî re hêjand. Ewî jorde li min meyzekir û wî jî destê xwe ji min re hêjand. Min kire qîr û got: Min pirtûka te ya bi navê Birîna Reş beriya nihû xwend, gelek xweş bî. Lê wî tiştek ji min fêm nedikir. Min du sê caran li ser hev got, lê wî dîsa ji tiştek fêm nekir. Paşê ew rabî ser xwe û bi destî ji min re got were ber derî. Wî derîyê otobûsê da vekirin û ez jî çûm li ber derî û ji min re got: “Tu çi dibêjî xorto?” Min gotê: “Ma tu ne Mûsa Anterî? Got: “Belê.” Min got: “Min pirtûka te ya bi navê Birîna Reş ji berîya demekê xwend. Got: “Ha, eferim xorto. Tu dizanî bi Kurdî bixwînî?” Min bi serbilindî got: “Erê ez dizanime.” Ya rast, ez gelekî li ber xwe re jî çûm. Ji ber ku ez yek ji wan kêm kesan bûm ku min dikarî ez bi Kurdî bixwînim û niha jî ez bi nivîskarekî ku min pirtûka wî xwendî re diaxivîm. Cara ewilî bû ku min nivîskarek rû bi rû didît û pê re axivîm. Ewî dîsa derî girt û çû li cihê xwe rûnişt. Lê belê ez dîsa çûm li ber camê sekinîm û min seyra wî kir heta otobûs birêket û çû. Û ew dîmen hê jî li ber çavên min e!

Belê, jî beriya 32 salan, ango di 20’î Îlona 1992 yê de ew ji aliyê hêzên tarî ve li Amedê hate qetil kirin. Bê goman mîratê wî hêlayî û rêça wî û rêhevalên wî danî, ji bo zarokên Kurdan bû riya serxwebûnê û heroj xurttir dibe. Bila gora wî û yên mil bi milê wî re û li ser dewsa wî canê xwe dayîn biheşt be. Em wan bi minnet bi bîr tinîne. Erê, ew dîmen hê jî li ber çavên min e!

# Bi rêxistinbûna gelên herêmê rewşa çandiniyê û aboriya civakî tê pêşxistin

Piştî lidarxistina civîna salekê ya Komîteya Çandiniyê li Kantona Efrîn û Şehbayê, tevî êrişên rojane xebatên çandiniyê bi awayekî serkeftî bi rê ve çûn. Hevserokê Komîteya Çandiniyê Ferhad Dede diyar kir ku hemû berhemên tên bidesxistin dikevin xizmeta gel û aboriya civakî ya herêmê de.

**Zana Roj/ Şehba**



Êrîşên dagirkeriya Tirk li ser gelê Efrînê yê ku li Şehba bi cih bûne berdewam e. Tevî ku êrîş di asta herî jor de ne jî, lê gel di nava berxwedanî û pêşxistinê de ye. Şehba herêmeke bi çandiniyê tê naskirin, ku piraniya piştpêrastkirina wê li ser çandinî û darên zeytûn û fistiqa ye. Bi avakirina sîstema Rêveberiya Xweser piştî rizgarkirina herêmê û bi derbasbûna gelê Efrînê piştî dagirkirina Efrînê ji herêmê re, xebatê çandiniyê bi awayekî ku bikeve xizmeta gelê herêmê hatin aktîvkirin. Komîteya Çandiniya ya girêdayî Desteya Aborî li Kantona Efrîn û Şehbayê beriya demekê civîna xwe ya salê lidar xistin û nîqaşên xebatê şandiniyê û pirojeyên demên pêş bi berfirehî tê de hatin nîqaş kirin. têkildarî vê yekê Hevserokê Komîteya Çandiniyê Ferhad Dede ji rojnameya me re axivî.

**`Çandiniya sala 2023- 2024 bi serkeftî hate derbaskirin`**

Ferhad di destpêkê de bal kişand ser di mewsima derbasbûyî de xebat li ser bingeha pilansaziyên ku danîne hatin meşandin û wiha got: "Bê guman ger behsa xebatê çandiniyê yên salekê bikin bê guman wê aliyên wê neyînî û erênî jî hebin. Di destpêka sala çandiniyê de pilansaziyên berfireh hatin danîn û li ser wan xebat hate meşandin. hin ji wan ev bûn; ceh 108 hêktar, gendim 76 hêktar, nîsk 14 hêktar, hebreşik 7 hêktar û kemûn 7 hêktar hatin çandin. li ser van cureyan xebatê çandiniyê di sala derbasbûyî de hate meşandin. li gorî rewşa herêmê helbet pilansaziyên ku nehatine pêkanîn hebûn, yek ji wan me xwestibû ku em genimê avî biçînin lê pêk nehat ev yek jî vedigere rewşa herêmê û astengiyên ku dorpêç bi xwe re ava dike, ji ber avdan hemû bi sotemeniyê û jenetoran tê kirin.

Di asta giştî de weke nirxandina sala çandiyê ya 2023- 2024 bi awayekî serkeftî hate derbaskirin, cureyên ku me anîne ziman hemû bi rengê bejî hatin çandin û berhmdana wê li gorî pêwîstiya herêmê hate rakirin".

**Kêmasiyên ku di sala derbasbûyî de hatine rûdan**

Ferhad zehmetiyên ku rastî wan hatine anîn ziman û wiha got: "Herêma Şehabyê weke ku her kes dizane rojane siyasetên dijmin li ser wê tên gerandin, di aliyekî de êrîşên dagirkeriya Tirkiyê ya ku bûye sedema şewitînên mezin ji berhemên ku gel ji xwe re çandine, her wiha dorpêça Hikumeta Şamê ya ku astengdarê raseterast ji hemû berhemdarên ku di herêmê de divê bêne derketin re, di aliyê çandina cureyên avî de em kêm man ji ber avdan bi hebûna sotemeniyî tê kirin, lê rewşa herêmê berçav bû. Lê tişta ku bi me re bûye alîkar ew jî barana zêde ya ku sala derbasbûyî de bariye, bi sedem ku çandiniya avî ser bikeve û neşewite. Her wiha di aliyê din de çandiniya Kemûnan bi me re bi ser neket ew jî di aliyê zanistî de hate destgirtin ku rewşa hawayê û germahiya ku di 2 rojan de ji 23 yan gihîşt 42 yan ev bû sedem ku mewsim bê şewtandin".

**Xebatên koparatîv ji bo pêşxistina aboriya civakî**

Her wiha Ferhad destnîşan kirk u pirojeyên koparatîv ji gel re hatin pêşxistin ku gel xwe bi xwe fînase bike û wiha pê de şû: "Yek ji pilansaziyên sala derbasbûyî me derxisti bû ew jî pêşkêşkirina pirojeyên kopatatîv ji tavahî gelê herêmê û koçberên Efrînê re bû. Ev yek bi tensîq bi deste û aliyên têkildar re hate orgenîze kirin, di encamp de hejmara erdên ku di destê komîteya çandiniyê de dewrî gel bêne kirin, ji bo vê xebatê komîteyeke taybet hate avakirin û xebatê xwe dan meşandin. Bê guman pirojeyên koparatîv ji gel re di asta herî jor de bû alîkar û weke gaveke pêşketî di aboriya civakî ya gelê herêmê de hate dîtin. Hejmareke mezin ji malbata tê de kar kirin, nêzî 1000 kes tê de sûd wergirtin. Li ser vê bingehê îsal jî ev xebat hate pêşxistin ku gel jê sûdê werbigire. Bi giştî 2700 hêktar ji bo pirojeyên koparatîv hatine veqetandin jê 400 hêktar sewildarî ye da ku xwediyên pez jî sûdê bibînin, her wiha bi rengê koparatîv hejmareke mezin ji darên zeytûn û fistiqan dewrî gel hatin kirin.

Aliyên ku em bi gel re bûne alîkar erd hatin dayîn, her wiha tûvikên ku xwestine biçînin ji genim, ceh, nîsk, nok, kemûn û hebreşik hatin top kirin û li malbata hatin belavkirin. Di aliyê semad de me hinek zehmetî dît ew jî me ji derva kirî û bi nirxê hatiye kirîn hate firotan û bi dên jî hate dayîn heyanê dawiya mewsimê her wiha ev yek ji bo tûvikan jî derbasdar bû. Xebatê koparatîv bi hemdemiya dorpêç û rewşa aborî ya gel û herêmê re jêdera debarkirinê û pêşxistina kar bû, malbatên ku ji çandiniyê hez dikin û dizanin her wiha ji malbatên ku tu jêdereke aborî pê dabara xwe bikin nîne re bû cihê alîkariyê û gel ev yek bi awayekî erênî qebûl kiriye, li ser vê bingehê di demên pêş de wê ev xebat zengîntir bibe".

**Bi nirxekî wekhev sotemenî hate belavkirin**

Ferhad di berdewamiya nirxandina xebatê çandiniyê de wiha axivî: "Li gorî şert û mercên heyî em di aliyê belavkirina sotemeniyê de li ser cotkaran heyanî astekê em bûne alîkar. Di dema patozan de mazot li ser xwediyên wan patozan û cotkaran bi nirxên guncav hate belavkirin, bê guman armanca me ji vê yekê ew bû ku sotemenî ji aliyên derve neyê kirîn û bi nirxên buha li gel xwediyê zeviyan neyê firotan. her wiha ev yek bi tensêq bi aliyên têkildar weke yekîtiya cotkaran û TEV- DEM re hate çêkirin. Ev hemû hewikdan hatin û tên kirin da ku em rewşa çandiniyê li herêmê pêşbixin û bi gel re bibin alîkar".

**Berhemên derdikevin dikevin xizmeta gel û aboriya herêmê de**

Ferhad da zanîn ku berhemên derdikevin di herêmê de dimînin û wiha got: "Li gorî pilansaziyên ku derxisti bûn 17 hêktar ji erdên di destê çandiniyê de pîvaz hatin çandin, di van 17 hêktaran de zêdetirî 6 mehane rojane nêzî 80 kedkar tê de kar dike û sûdê dibîne. Niha ev berhemên ku em radikin di herêmê de tê belav kirin, da ku ticarên ji derve derbasî vir nebin û em van berhemên ku bi keda gel hatine rakirin di sûkên herêmê de bi nirxên gûncav bifroşin. di heman demê de berhemên ku ji tûvikên hatine şandin, bi taybet genim di herêmê de dimîne bi taybet ev genimê ku dibe ard li ser firingehên herêmê tên belavkirin. li ser van pîvan û nirxan hemû berhemên ku di herêmê de têne têne çandin û bidestxistin dikevin xizmeta gel û aboriya civakî ya herêmê".

Têkildarî erdên nêzî xetên sînorên dagirkeirya Tirkiyê de Ferhad wiha axivî: "Li seranserî herêmê erd li ser gel hatin belavkirin. Ji ber taybetmendiya herêmê û nêzîkbûna xetên dagirkeriyê ji erdan re, hejmarek ji erdên ku nêzî sînor zirarên şewatê dîtin. Bi taybet di encama topbarana dagirkeriya Tirkiyê de li xetên gundewarên şêrawa, navçeya Ehers û fafînê de şewat hatin rûdan".

**Bi pilansaziyên zengîntir wê sala nû ya çandiniyê bê destpêkirin**

Ferhad di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku di dawiya sala çandiniyê de civînek berfireh ji bo nirxandina rewşa çandiniyê û pêşxistina pilansaziyên demên pêş hate lidar xistin û wiha got: "Di civîna ku hatiye lidar xistin de gelek nirxandinên berfireh ji bo sala derbasbûyî hatin kirin, her wiha bi biryar û encamnameke xurt derket holê. Yek ji gavên sereke yên ku emê bavêjin ew jî ji nû ve aktîvkirina bîrên ku di encama erdhejê de hatine sekinandin, ev yek jî bi desteya şeredariyê re hate tensîqkirin, armanca me derxistina avê û pirojeyên avî pêş bixînin. Helbet pirojeyên avî mesrefa wê jî zêde ye, di vê çarçoveyê de me altirnatîva enerjiya tavê pişniyar kir. her wiha ji bo xebatên koparatîv bu derbasbûna du salan li ser van pirojeyan re, em bi pilansaziyên nû ku çawa daha zêdetir vê yekê pêşbixînin û bixin xizmeta gel derketin. her wiha bidara gel me ji 6 salan de em wiya diçînin êdî hêdî hêdî kêm dibe, di vê warî de emê tûvikên nû derbasî herêmê bikin; ev yek jî di asta giştî de bi Bakur û Rojhilatê Sûriyê re tê nîqaşkirin. Bê guman di giştî de armanca me em çawa aboriya civakî û herêmê di aliyê çandiniyê de pêş bixînin e.



## Girîngiya çandê di têkoşîna gelan de

**Hafiz Ahmet Turhalli**

Pirsa çanda gelan pirseki giringe! Mirov bi çanda xwe tê nasandin û di nava civakên dinyayê de, bi pîvanên çanda xwe tê bicîh kirin. Çandên gelan nasnameyên wanan ên dîrokîne. Lewra çand dîroka raburdeya wî gelî bû, di hundirê demê de hatiye hûnandin. Her Ol û Bawerî jî weke çandekî di nava civakande xwe bi cîh dikin. Mirovahî behsa çandan dike û ev çandên hanê, dîroka mirovahîyê vedibêjin. Kijan gelî çi ajotiye û çi ava kiriye? Henek gel hene weke mînak: Çanda wanan çanda şer û talanêye. Bi şer dagirkerî û talanê hatine nasandin. Henekî gel jî hene, bi çanda aşitî û civakbûnê têne nasandin.

Xwedê dema behsa mirovbûnê dike, weha dibêje: "Gelî mirovan! Bê guman me we ji mê û nêrekî afirand, me we wergerand ji êl û eşîran, jibo hûn hevdû binasin, li ba Xwedê qenctirînên we, ew kesê ku berpirsiyariyên xwe li berامber Xwedê bicîh tîne. Xwedê her tiştî dizane û ji her tiştî agahdare." (Hucurat 13)

Mirov di vê ayeta de dibîne ku Qur'ana pîroz behsa merheleyên avabûna civakan û çandan dike. Ev avabûn, bi îradeya Xwedê hatiye pêşxistin. Lewre ew dibêje; Me we wergerand ji êl û eşîran. Dema mirov çanda gelan nas dike, dibîne ku çand hene di nava xwede pêş ketine û çand jî hene bûne gerdûnî. Çandên gerdûnî bûne samanê mirovahiyê. Cudabûna çandan û zimanan ayetên Xwedêne. Bi wateyekî din ew keda ku Xwedê daye û pê mirovahî pêş ketiye. Divê qedrê keda Xwedê were girtin û çandên milletan werin parastin. Bi taybet em gelê Kurd bi destên dewletên Tirk, Ereb û Farisan ve bi qirkirina çandîre tên derbas kirin. Tirk Ereb û Fars ji bo çanda me tunne bikin, hemû amûran bikar tînin. Herî zêde ji bo çanda Kurdan û kevneşopiyên wan tunne bikin, Ola Îslamê bikar tînin. Weke Mînak: Çanda Ereban, Tirkan û Farisan çandekî Îslamî û ya Kurdan jî weke çandekî dij Îslamî didine nasandin. Çanda herî qedîm ku li ser rojhilata navîn bandora xwe kiriye, çanda gelê Kurd û Kurdîstanêye. Çanda qîmet danîna jinê, xwendinê, civakbûnê, hevkariyê, mêvan perweriyê, cesaretê, berxwedanê, ji zarokan heskirinê û hurmeta mezinan girtinê çanda gele Kurd ya kevnareye. Ev Çand heman demêde çanda Îslamêye û yê hemû olane. Ev çandeke ku li cîhanê belav buye. Çanda dagirkirinê, kuştin û talan kirine, qedexe kirina ziman û çandan, ne çanda me Kurdane. Divê em Kurd li çanda xweya dewlemend xwedî derkevin. Ji ber ku dijmin û dagirkerên me dixwazin ziman û çanda me ji holê rakin. Di çanda mede kuştina zarokan, bêbextî, teslimiyet, tirs û xwefiroşî nîne. Çanda me bi hezaran salane ji hêla Bav û Kalên meve hatiye hûnandin. Neha dagirkerên me di şûna vê çanda paqij û bilind de dixwazin çanda xweya qirêj û kirêt cîbicîh bikin. Divê em di mala xwede, di saziyên xwede, di kolan û koçeyên xwede çanda xwe bijîn û bidin jiyîn. Divê Kurdên Avrupa û yê cîhanêjî li çanda xwe xwedî derkevin. Festîwala çanda Kurd ku bûye serpêhatiya gelê meyê Evrupa tê lidarxistin, divê hemû gelê me tevlî vê festiwalê bibe. Çand jiyane, dev ji jiyanê nayê berdan.



# PYD'ê ji bo demokratîkirina Rojhilata Navîn xeta 3'emîn e

Hevserokê PYD'ê Salih Muslim, endamê PYD'ê Mehmûd Hemê û Berdevka PYD'ê Sema Bekdaş diyar kirin ku PYD'ê dikarîbû sînorên partiyên kilasîk bişkîne û wek partiyek nûjen li gorî şert û mercên demê civakê birêxistin bike û pêşengtiyê ji sîstema hevserokatiyê re bike.

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Di dema ku tevahî partî û rêxistinên heyî, propagandaya bîrdozî û rêgezên dûrî çanda gelê Kurd û yê Sûriyê dikirin, Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD'ê ava bû. Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD'e di 20 Îlona 2003'an de hat avakirin û ev 21`sal in bê navber xebatên xwe yên siyasî û rêxistinî dimeşîne. PYD'ê di nav 21 salan de têkoşînek siyasî di qada Rojavayê Kurdistan û Sûriyê de, li pey xwe hişt. Bi vê yekê piştgiriya mezin a civaka Kurdistanê, Sûriyê û bi taybetî Rojava qezenc kir. Piştî nirxnadina rewşa li ser erdê, komek rewşenbîr û xebatkaran dîtin ku divê rewş were sererastkirin û ji bo vê jî PYD ava kirin. Bi avabûna PYD'ê re, ramanên rewşenbîrî û ronakbîrî li ser astên civakî, çandî û hişmendî pêkhat. Avabûna PYD'ê di demekê de hat ku herêm derbasî qonaxeke nû dibû. Di wê qonaxê de gelek pêşketinên li ser asta herêmî û navdewletî rû didan. Di wê qonaxê de meşandina rêbazekî şoreşgerî pir girîng bû.

**PYD'ê xeta ku ewlehiya gelan diparêze**

Ji despêka avabûna PYD'ê û li gel propagandayên reşkirinê li dijî wê, PYD'ê rastî astengiyên giran û mezin hat. Rêjîma Baas bi hemû hovîtiya xwe bi ser endamên partiyên de diçûn, hebûna Kurd qebûl nedikir. Zindan bi xebatkaran tije dikirin. Hêjmarek pêşeng û rêveberên wê bi destê hêzên cuda jî hatin şehîdxistin. Her wiha di sala 2011'an û bi despêkirina aloziya Sûrî re, PYD`ê tevlî TEV-DEM'ê bû û li ser bingeha Neteweya Demokratîk, xeta sêyemîn hilbijartin. Xeta ku ewlehiya gelan diparêze û pêkanîna hevjiyaneke aştiyane navbera hemû pêkhateyan de ye. Ji bo yekîtiya netewî ya civaka Kurdistanê, hertim PYD'ê xwediyê serpereştiyan bû û beşdarî hemû xebatên yekrêziya Kurdî bû.

Derbarê salvegera damezarandina Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD`e, Hevserokê Partiya Yekîtiya Demokratîk Salih Muslim, endamê Meclisa Partiya Yekîtiya Demokratîk Mehmûd Hemê, Di heman babetê de Berdevka Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD'ê Sema Bekdaş ji rojnameya me re axivîn.



**Salih Muslim**

Hevserokê Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD'ê Salih Muslim da zanîn ku hewcedariya gel bi partiyeke siyasî hebû û wiha got: "Beriya avakirina PYD'ê ku di sala 2003'an de, lêgerînên me hebûn û di sala 2003'an de em gihiştin baweriyekê ku pêwîste tevgereke me hebe û hewcedariya civakê jî bi partiyeke siyasî hebû, da ku kar û xebatekî ji bo civakê bide meşandin. Bingeha vê xebatê jî, hişyarîkirin û rêxistinkirina civakê ye, PYD'ê li ser vê bingehê hate damezrand. Tevî ku berê jî civaka me ji xebatên siyasî ne dûr bû, lê ew siyaset bê encam bû, ji bo wê erke PYD'ê ew bû ku civakê komî ser hev bike. Di heman demê de civak hewcedarî perwerdeyeke ku ji hev ne qut be û xwe di milê xwendin û zanînê de pêş bixe, ev yek her tim ji civakê re pêwîst dike. Li kêlek wê jî hişyarkirinên ji bona ku gel çawa xwedî li xwe derkeve û bi ruh û fikirên azad li pêş xwe binêre, da ku mirovên azad bên avakirin, ev jî karekî dawî lê tuneye, ji ber çiqasî ji bo azadiyê bike têrê nakê, lewra têkoşînên me heta niha berdewamin."

**'Komkirina civakê bi nêzîkbûna hizirên civakê pêk tê'**

Salih Muslim eşekere kir ku PYD'ê fedekarî ji bo civakê kir û wiha got: "Li gorî şert û mercên demê jî, me karîbû di sala 2003'an de, civînên xwe çêkin û xwe birêxistin bikin. Her wiha bi destpêkirina serhildana Qamişlo ya ku di sala 2004'an de pêk hat, partiya ku bêtir tê de rol lîstî, PYD'ê bû, her kesî em sûcdar kirin û me jî li gorî wê fadekarî kir, gelek mirovên me şehîd ketin, berxwedanî kirin û heta roja îro jî, dev ji erka xwe bernedan. Di heman demê de ji bo ku mirov karibe civakê giştî komî ser hev bike, beriya her tiştî divê fikirên civakê nêzî hev bikin, ev yek jî pirojeyek jêre pêwîst dikir, lewra piroja niha me derxistiye, piroja Xweseriya Demokratîk e.



**Mehmûd Hemê**

Ji xwe destpêkê ji bo civak xwe birêve bibe, meclisên xwe hatin avakirin, ew meclisana jî li gorî fikir û felsefeya Rêber Apo ye ku niha jiyana me li ser tê meşandin, ev yek jî ji sala 2007'an de me dest pê kir, tevî ku şert û mercên wê demê teng bûn, lê karê me di wir de nehat rawestandin. Lê di dema ku hate xwestin, civak bi giştî birêxistinkirîbû."

**'Rêjîm astengiya herî mezin bû'**

Salih Muslim diyar kir ku bi destpêkirina bûyerên li Sûriyê PYD'ê bû pêşeng û wiha got: "Di sala 2011 û 2012'an de dema alûziyê li Sûriyê tevahî dest pê kir, bingehê me yê birêxistinkirî hebû, wê demê me di wir de jî pêşengî kir, weke siloganên dihatin berzkirin, pirojeyên dihatin lidarxisitin û tiştê ku pêwîste bi piratîkî bê kirin me pêk anî, ev jî bawerî li cem civakê da avakirin û li gorî wê tevlî vî karî bûn û kesên ku di wê demê de tevlî me bûn, niha cihê xwe di nav Rêveberiya Xweser de digirin, ev jî kêfxweşiyeke ji bo me ku me tiştek ji bo civaka xwe kiriye. Tevî ku gelek astengî li pêşberî me hatin. Berî her tiştî di destpêka avakirina PYD'ê de Rêjîma Baas hebû, rêjîm astengiya herî mezin bû, çi kesê ku bi PYD'ê re danûsitandin dikir, ew rastî işkenceya rêjîmê dihatin û lêpirsîna wan dihate çêkirin, bi taybet di serhildana 2004'an de, ji zexta rêjîmê tu kesî nediwêrîbû ku bêje ez dostê PYD'ê me. Astengiya din jî, têgiştin, bawerî û zihniyeta gel bû, ji ber ku heta bi gelekî bercewendiyên wî bi wî bide nasîn, demek jêr pêwîst dike, heta niha jî em guhertina zihniyeta hemû pêkhateyan dikin. Her wiha astengiya piştî ku şoreşê dest pê kir jî ewbû, êrişên ji derve yên di aliyê siyasî û leşterî, ji ber bi van êrişan hemû xebatên me di armancê de ne, lewra di herêmî û navnetewî de ev dibûn astengî."



**Sema Bekdaş**

**'Şaştiyên istiratejîk gel û mirov winda dikin'**

Hevserokê Partiya Yekîtiya Demokratîk Salih Muslim axaftina xwe wiha qedand: "Bangewaziya me ew e ku ev 21 sale em têkoşînê dikin û ev têkoşîn roj bi roj berfireh û mezin dibe, bê guman di hin cihan de pirsgirêk û şaştiyên me derketin, lê heta niha em isbat dikin ku me şaştiyên istiratejîk nekir, ji ber şaştiyên istiratejîk gel û mirov wenda dike, lê siyasetên rêveberiyê me bi xwe danîn, ev jî ji xeta 3'emîne ku îro şoreş giştî xwe pê digire. Em jî hêvî dikin gelê me heqîqetê bibîbe û şerê qirêj ê ku bi riya propaganda li ser me tê kirin, bawer nekin."

**'Gel bi rengekî sîstemlîk tê perwerdekirin'**

Di heman mijarê de Mehmûd Hemê diyar kir ku Partiya Yekîtiya Demokrat PYD`ê partiyeke siyasî konfedralî û demokratîke û wiha got: "PYD'ê di 20 Îlona 2003`an de li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatiye damezrandin û ew partiyeke sereke di nav partiyên siyasî yên dijber ên Sûriyê de ye. Her wiha PYD'ê di parastina gelan de ku ne tenê ji bo gelê kurd, lê ji bo Sûriyê giştî, partiyeke sereke bû. Di heman demê de ji aliyê PYD'ê ve, gel bi rengekî sîstemlîk tê perwerdekirin û bingeha wê li ser zimanê dayikê, pergala Neteweya Demokratîk, jiyaneke hevbeş, pêkanîn pergala hevserokatiyê û azadiya jin hat girtin. Ya girîng jî avakirina civakeke ekolojîk, exlaqî û polîtîk e."

**Yekirina partiyên kurdî**

Endamê Meclisa Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD`ê Mehmûd Hemê axaftina xwe wiha qedand: "Di van salên dûr û dirêj de gelek kelem û astengî li pêşberî me derketin, yek jî neqebûlkirina navnetewî ji piroјeya Rêveberiya Xweser li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê de. Her wiha me jî gelek hewldan kirin, ji bo lidarxistina kongirekî netewî, lê ew jî nehat kirin, ji ber gelek pirsgirêk hebûn, lê dîsa jî hewldanên me hene ku em vî kongirê netewî li dar bixin û hevdîtina bi hemû partiyên kurdî re bê kirin, da ku yekirina partiyên kurd û gelên kurd li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Kurdistanê bê avakirin."

**'PYD`ê pêşengtiya sîstema hevserokatiyê kir'**

Di heman babetê de Berdevka Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD'ê Sema Bekdaş anî ziman ku ew 22'emîn salvegera partiyê pêşwazî dikin û wiha got: "Ev 21 salin ji ked, têkoşîn, berxwedan û şehadet. Her wiha gelek nirxên giranbuha di damezrandina partiyê de hatin dayîn û em wan şehîdan bi bejneke tewandî bi bîr tînin. PYD'ê ji destpêka şoreşê û heta niha roleke pêşeng û mezin lîst, da ku karîbe li gorî her qonaxê bibe bersiv. Û dikarîbû di hundirê Sûriyê de û di nava xwe de perensîbê demokratîk bigire. PYD'ê perensîbê xwe li ser bingehê azadî, wekhevî û têkoşîna jinê ya li hemberî hemû hişmendiyên ku hemû cûreyên tûndiyê li ser jinê pêk tîne, ava bike. Her wiha yekemîn partî bû ku pêşengtiya sîstemên hevserokatî kir û ev yek bûye bingeh li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê û cîhanê de ku wek pergalekî nû şêwazê birêvebirinê di Rojhilata Navîn û cîhanê de tê pejirandin. Di heman demê de, yek ji têkoşînên me yên sereke, beşdarbûna jin di nava siyaseta demokratîk de. Û wekî tê zanîn ji serê sedî 50 di nava meclisên partî giştî de jin heye, lê tevî wê jî di sala 2018`an de Meclisa jin a taybet di hundirê partiyê de hat avakirin û qotmîteyên xwe yên dibolomasî, perwerdê, rêxistinî û abûrî hene, ev jî gaveke serkeftî bû ku jin di aliyê siyasî de hîn bêtir bi rol û misyona xwe bilîze û pêşengtiyê ji partiyê re bike. PYD'ê dikarîbû rewşa partiyên kilasîk bişkîne û wek partiyek nûjen li gorî şert û mercên demê civakê birxistin bike. Tevî ku rojane di asta Rojhilata Navîn de guhertin çêdibin, lê ji ber ku PYD'ê xwedî proje û kede û hêzê karîbû destkeftiyên heyî biparêz e."

# Dixwazin bi rêya sîxuran pergala Rêveberiya Xweser têk bibin!

Dewleta Tirk a dagirker bi hevkariya Istixbarata Parastin a Başûrê Kurdistanê û Partî Demokratî Kurdistan PDK`ê di yek sengerî de sîxuran li dijî Rojava ava dike. Şerê nasnameya gelê kurd dike, herwiha dagirkeriyê pîroz dike û dixwaze pergala Rêveberiya Xweser bixîne pê re jî armancê dagirkeriyê pêk bîne. Lê li hemberî van sîxuran yê ku nirxên kurdan diparêzin jî hene.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Êrişên dewleta Tirk a dagirker li dijî Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûriyê berdewamin, helbet bi van êrişên dagirkeriya Tirkiyê re, ziyaneke mezin dighêje gelên vê deverê, bi taybet kesayetên giranbûha ango pêşengin, him jî cihên ku gel jê sûdê werdigire bi rengekî hovane tên bombebarankirin, dihêlin ku zarok, jin û hemû beşên civakê qîr bikin û binalin. Di heman demê de wekî ku tê zanîn û her kes dibîne jî ev êriş zêdetir bi riya balfiran pêk tên, lê ev balafir bêyî sîxuran bi kêrî tiştekî nayê û ne jî dikarin ziyanê bihghînin. Ev kar jî ENKS`ê, Istixbarata Parastin û MÎTa Tirk bi hev re birêve dibin û toreyan ava dikin, bi vî karê qirêj hewl didin li dijî Rojava bi taybet Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, ango Hêzên Sûriya Demokrtatîk QSD`ê û Rêveberiya Xweser êrişên mezin pêk bînin û dagirkeriyê biparêzin.



### PDK`ê ji dagirkeran re sîxuran ava dike

Bi xwendina dîroka gelê kurd re, du rê an jî rêbaz li pêş me tên, yek nirxên kurdan diparêze û yek jî li jêr navê neteweya kurd, xwîna ku ji bo azadiya hatiye rijandin difroşe, ya îro roj nûnertiya vê jî dike, Partî Demokratî Kurdistan PDK`e ye. Belgeyên van rastiyan jî, ji kesî ve ne dûrin, ger ku tim behsa rêbaza kurditiyê tê kirin, naxwe di sala 2014`an de çima çand, ziman, rastî û dîroka gelê kurd, civaka Êzîdî bi tenê hişt û ger ku Kerkûk wekî dilê Kurdistanê pênase dikin, çima îro roj radestî Turkmenan dikin û kurdên li wir lewaz dikin. Tevî ku di sala 2003`an de, bi peymaneke veşartî Kerkûk wekî bajarekî kurdan hatiye pejrandin û Mûsil jî hingî bûye para erban, heta çûn Îranê û li dijî partiyên Rojhilatê Kurdistanê yên Hewlêr jî li hev kir û di hundirê Başûrê Kurdistanê bixwede jî, ji bilî Hewlêr û Dihokê qet peywendiyên baş bi aliyên din wekî Silêmaniyê re tuneye. Îro jî Dihok dikeve destê dewleta Tirk û ala wê li ser yek ji pîroziyên kurdan kelha Hewlêrê bilind dikin. Çima serokê PDK`ê Mesûd Berzanî gotibû tu şoreş li Rojava tuneye û li Rojava xwîna bi hezarên jin û ciwanên kurd ji bo hebûna kurdan hatiye rijandin. Di heman demê de. Li Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî xwîna kurdan tê rijandin û şerê nasnameya kurd tê kirin, lê çima heta îro jî nûnerên wan li wê derê hene û dagirkeriyê pîroz dikin. Rêxistina bi navê xêrxwaziya Barzanî îro li Efrînê çi karî dike, bi ser van hemûyan de îro bi dewleta Tirkiyê re, di yek sengerî de sîxuran di nava Rojava ava dike û dixwazin pergala wê bixînin, tenê ji dîroka nêz de me behsa ewqas belge kirin, wê demê eşkere dibe kî nirxên neteweyî diparêze û kî jî dide ber bazarê.

### Hêzên Ewlekariyê weke bendekî sitûr pêşberî sîxuran radiwestin

Li vê derê em gihiştin çend rastiyan ku ev sêgoşeya me behsa wê kir, van karên qirêj li vê derê dimeşînin, lê hêzên Ewlelekariya Hundirîn li pey wanin û wekî bendekî sitûr li hemberî wan radiwestin, êdî birehetî nema dikarin tev bigerin û ne jî miradê xwe bi serî bikin. ENKS`ê, Istixbarata Parastin û MÎTa Tirk ev sêgoşe bi hev re di nava kordîneyeke kur de ne, pêşî Istixbarata Parastin ya PDK`ê ye, sîxuran ava dike û li Rojavayê Kurdistanê bi cih dike, ev sîxur bi piranî xwe li dor navendên ENKS`ê digirin, helbet ê ku li du van sûdmende jî MÎTa Tirk e ku bi hemû derfetên xwe vî karî fireh dike. Herwiha ji aliyên Hêzên Ewlekariya Hundirîn a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ve operasiyoneke xurt bi navê şehîd Şevger, Karker û Nagîhan Akarsil ve, li dijî şaneyên sîxuran ên ENKS`ê, istixbarata Parastin û MÎTê dest pê kiriye û heta niha gelek ji wan hatine girtin, hinek agahiyên xeternak eşkere bûn û sîxurên girtî li xwe mukir tên ku ev pira sîxurtî û dijminatiyê bi çi rengiye.

### Navenda Sêmêlê cihê avakirina sîxuran e

Di hemû lêkolîn û lêpirsînan de navendeke derdikeve pêş, ew jî navenda Istixbarata parastinê ya Sêmêlê ye, hemû kesên ku li dijî gelên Rojava sîxurtî kirine û ziyan gihandine gel ji hêla navenda Sêmêlê ve hatine xistin û ketine nava vî karê sîxurtiyê de. Navenda istixbarata parastinê ya Sêmêlê 14 km li Rojavayî bajarê Dihokê yê Başûrê Kurdistanê ye, li ser riya giştî ya Başûrê Kurdistan û Tirkiyê ye. Sîxur eşkere dikin ku di hundirê vê navendê de gelek beşên girtin û lêpirsînê hene, her wekî kesên ku sîxutiyê li pêş dixin jî hene, herwiha di dema lêpirsînê de, ne tenê rêveberên parastinê beşdar dibin, lê mîta Tirk jî beşdarî lêpirsînê dibe. Xebata wan jî ne tenê li vire, du navendên din pêve girêdayîne, ew jî kampa Domîz û Berdereşê ne, li Kampa Domîz bi piranî endamên koma bi navê Pêşmergeyên Roj yên girêdayî ENKS`ê lê dimînin û perwerdeyê dibînin, herwiha kampa berdereşê jî qaşo li herêma Dihokê ji bo koçberên ji Rojavayê Kurdistanê re hatiye avakirin, lê koma bi navê Pêşmergeyên Roj ên ku li Kampa Domîzê ne, bi riya internet û telîfonan bi gelek kesên li Rojavayê Kurdistanê diaxivin û wan dikşînin Başûrê Kurdistanê, herî zêde berî didin kesên di qada leşkerî ya Rojava û dixwazin wan bixînin nava karê sîxurtiyê de.

Piştî ku ev kes derbasî Başûrê Kurdistanê dibin, cihê wan ê destpêkê navenda parastin a Sêmêlê ye, herî kêm 20 rojan di lêpirsînê re derbas dibin. Di bin navê lêpirsînê de bi riya pere, gef û destdirêjiya zayendî wan dikin sîxur, eger sîxurtî qebol kirin, wan dişînin perwerdeyeke taybet û bi vî rengî wan derbasî kampa Berdereşê dikin, li wir tên cerbandin û şopandin, eger ku wekî wan be, hingî wan derbasî Rojavayê Kurdistanê dikin, ji bo armancê parastin, ENKS`ê û mîta Tirk bi cih bînin. Kesên di navenda Sêmêlê de jî evin; Seydayê Xerîb, Seydayê Welat, Seydayê Teyb û Leyla, ev kesana toreke sîxurtiyê ava kirine û hîna jî ava dikin, ev kesan şaxê xwe li kampa Berdereş û Domîzê zêde belav kirine û li wir ciwanên Rojava dixin xefkê de û bi kar tînin, bi karê xwe yê bi hev re ciwanan dikin dijminê gelê wan û bi rêbazê hew jê qirêjtir zarokên kurdan bi destên wan didin kuştin.

### Li şûna bergeriya welatê xwe bikin, xwe bi erzanî difroşin

Kesên ku dibin sîxur bi mebest û miradekî dilê xwe xweş dikirin, bey ku rastiya welat, bajar, gund û malbat wan were bîra wan, li ser pişta destkeftiyên bi hezarên şehîdan bûn sîxur. Wexta ji qobleya şoreşa Rojava derdikevin û dekevin hundirê Başûrê Kurdistanê, demarê sîxurtiyê di hundirê wan de sitûr dibe, dema dighêjin Başûrê Kurdistanê, qêrîna zarokên Rojava xistin bin cilika pereyan û erzaniyê û di cihê cih de ji bo çend qiroş pere her tiştî difiroşin û didin ber bazarê. Ev kes li şûna bergiriyê di ber bajarê xwe de bikin, bi parastin û MÎTa Tirk re hevkarî dikin û agahiyên berfireh bi wan re bi parve dikin.

### Bost bi bost ji dijmin re cih destnîşan kirine

Ji rêzê ye ku kurd pirsa rewşa kurdan dikin, lê di dema ku Istixbarata parastin ciwanên Rojavayê Kurdistanê li Başûrê Kurdistanê digirin, ji dêvla pirsa rewşa wan an jî zehmetiyên li Rojava bikin, di pêşî de agahiyên tevgerên leşkerî ji wan dikin, piştre cih û deverên ku lê kar kirine. Û ev sîxur çi di destê wan de hebin pêşkêşî parastin û MÎTê dikin, hingî agahiyan didin wan, mirov di nava wan de winda dibe, ji ber bost bi bost hemû dever destnîşan kirine. Tişta ku mirov hêrs dike ev sîxur bûn sedema şehadeta gelek hevalên ku bi hev re kar kirine. Li tenişt vê yekê jî gelek cihên din, niha di metirsiyê de ne, ji ber Istixbarata parastin agahiyan bi dest dixe û dighîne dewleta Tirkiyê. Parastin li vê derê sînordar namîne, destpêkê ciwanan fêrî madeyên hişbir û karên xerab dikin û hêdî hêdî agahî û zanyariyan ji wan dikşînin, piştre wan sîxuran pilan dikin û derbasî Rojava dikin êdî li ser erdê bi wan re kar dikin, da ku cihê kordînatan bidin, mayînan deynin û CBS bixin erbeyan, ji bo ku dagirkeriya Tirk karibe wan bibombebaran bike. Û Erka sîxuran ew e ku piştî agahiyan bidin û balafir bombebaran bike, biçin belge bikin û wêneyan bikşînin û gelek caran hatiye dîtin dema ev yek dibe, malpera ENKS`ê di kêliya êrişê de yekser wêne û agahiyan belav dike.

### Sîxuran hesab nekirbûn bikevin xefka parêzvanên vî welatî de

ENKS`ê bi Tirkiyê re beşdarî hemû sûcên li dijî gelê kurd dibin û têkiliyên kur û dûr di navbera çeteyên ku li herêmên dagirkirî dimînin û Istixbarata parastinê ya Başûrê Kurdistanê de jî hene. Herwiha Istixbarata parastin bi hemû hewldanan dixwaze hemû fermamdarên bibandor ên li Rojava bikin armanca dagirkeriyê. Bi van agahiyên ku ji sîxuran digirin dixwazin destê Tirkan xurt bikin, ji bo ku deha bêtir xeteriyê li ser hêzên gel çêkin. Lewra bi van mebestan xwe berdabûn nava dilê Rojavayê, bi qestekî mişt xwîn hatibûn qubleya Kurdistanê, lê nezanîn ku dê bikevin xefka parêzvanên vî welatî, hîna digotin dê vê û wê bikin, lê dîtin ku li xwe mukir tên û nikarin pilanên MÎTê û parastinê bi serî bikin.



## Roja Aştiya Cîhanî û şerê cîhanî!

**Ahmet Aktaş**

Dibe ku sernivîs balkêş û nakok were dîtin; ji ber aştî û şer wê çawa werin ba hevdû? Lê mixabin hatin e ba hevdû û dibe ku siberojê dîsa werin ba hevdû. Çawa? Di 1’ê Îlona sala 1939an de, artêşa faşîst a Hitler, êrîşa dagirkerî ajot ser Polonyayê û şerekî mezin derket holê. Jixwe şerê cîhanî yê 2an li ser vê êrîşa dagirkerî despêkir. Bi giştî êrîşkariya Hitler, ji aliyê herdû aliyên dijber ewqas xeter hat dîtin ku, di bin serokatiya DYEyê de dewletên emperyalîstên Rojava û di pêşengtiya Sovyet Rûsyayê de eniya Rojhilat, li dijî faşîzma Hitler bûn yek.

Her wiha bi encama vê lihevhatina navnetewî re, di destpêkê de(1981’an)1’ê Îlonê(roja dagirkirina Hitler a Polonya), piştre(2001an) 21’ê Îlonê, ji aliyê Saziya Netewên Yekgirtî(NY) ve weke Roja Aştiya Cîhanî hat pejirandin û ragihandin. Ev, ji aliyê cîhanî ve bû û her wiha tê dîtin ku peywendiyên aştî û şer çawa dikarin bi hev re bin. Ji aliyê Kurdistanî ve jî, bûyerên giring û watedar ên di vê heyvê de rûdan e hene.

Her çar pêşengên çalakiya rojiya mirinê ya 14’ê Tîrmehê(1982’an); M.Hayrî Durmuş, Kemal Pir, Akif Yilmaz û Ali Çîçek di vê heyva Îlonê de şehîd ketin e. Her wiha bi êrîşa hewayî ya dewleta faşîst a Tirk(2011’an), Rustem Cûdî şehîd keti ye. Di 16.9.2022 de, bi êrîşa polîsên dewleta qirker a Îranê Jîna Emînî hat şehîd kirin. Erê, bi van êrîşên xedar ên faşîzmê re, gelek rûdanên xemgin hatin serê gelan û tevgêrên azadîxwaz. Lê weke di van mînakan de jî hatin e dîtin, van êrîşên dilêş û xemgîn, bi xwe re li dijî xwe çalakî, serîhildan û hwd. bûyerên bi rûmet jî diafirînin. Weke bi mînaka êrîşa ser Polonyayê re şerê cîhanê 2’an destpêkir; êş, elem, keder pêkhat, lê di heman demê de li dijî wan, li gelek welatan şoreş hatin afirandin û her wiha Roja Aştiya Cîhanê jî hat ragihandin. Mînaka çalakiya lehengî ya 14’ê Tîrmehê û şehadeta hevalên pêşeng, bi xwe re rih û îradeya ji pola ya xweragir a berxwedêr a şoreşgerî afirand. Her wiha di encama van çalakiyên qehremane de, Pêngava 15’ê Tebaxê(1984’an) hat lidarxistin û Şoreşa Rojava pêkhat û hwd. destkeftiyên hêja û bi rûmet hat bidestxistin. Bi mînaka berxwedana Jîna Emînî re, gelê me yê Rojhilat rabû ser piya, bandora xwe li hemû parçeyên Kurdistanê, Îranê, herêmê û cîhanê jî kir.

Her wiha dewleta kevneperest a mêtinger û qirker Îran lerizî, mîna erdhejê lêhat û her wiha her sê dewletên din ên mêtinger jî hatin tirsandin. Wisa diyar e ku, Hitlerê vê serdemê, wê bibin Receb û Netanyaho; yek êrîşên qirkeriyê dibe ser gelê Kurdistanê, yê din jî dibe ser gelê Filistînê. Çawa Hitler bû sedema cenga 2’an a cîhanê û di encama faşîzma xwe de şikest û xwe kuşt(intixar kir), Receb û Netanyaho jî bûne pêşengên (kujerên)qirkeriya cenga 3’an a cîhanê û wê bi aqûbeta Hitler, di xwîna xwe de bixeniqin! Û dirûşma Rêber APO Jin, Jiyan, Azadî biserdikeve!



# Stêrk Gulo: Seyîd Evran şoreş bû

Rojnamevan û rêhevala têkoşînê ya Seyîd Evran, Stêrk Gulo da diyar kirin ku pêşengiya Seyid Evran ji bo pêşxistina xebatên Ragihandina Azad ji nifşên nû re derfetek mezin ava kir û bû nexşerêyek.

**Argêş Gewda/ Qamişlo**

Rojnameger û nivîskar Seyîd Evran yek ji pêşengên avakirina Çapemeniya Azad, di sala 1979’an de li navçeya Hênê ya Amedê ji dayik bû, zêdeyî 30 salan di xebatên Çapemeniya Azad de bi awayekî çalak cih girt. Evren di 22’ê Îlonê a 2023’an ji ber nexweşiya dil, li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê şehîd bû.

Derbarê salvegera şahadeta rojnamevan û şoreşger Seyîd Evran de, rojnamevan û hevala wî ya tekoşînê Stêrk Gulo ji rojnameya me ra axivî.

### ‘Seyid Evran dildarê rastiyê bû’

Stêrk Gulo di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser têkoşîna şehîd Seyîd Evran û wiha got: “Ev demekê dirêj bû ku me heval Seyîd Evran nasdikir. Hevalê Seyîd, ji Bakurê Kurdistanê bajarê berxwedanê li Amedê navçeya Hênê ji dayik bû. Malbata wî di dîroka serhildanên Kurdistanê de, berxwedaniyek mezin meşandi ye. Wî bi rihê welatparêzî û yêkitiyê xwe xemilandibû û bibû Kurdistanî. Hem wek şoreşgerekî, hem jî wekî rojnamevanekî çapameniya azad xwe gihandibû lûtkeyekê mezin. Di derheqê serhildanên Kurdistanê de xwedî agahiyek mezin bû. Heval Seyîd hewil dida ku rastiya Kurdistanê derxîne rûyê erdê û bibe dengê rastiyê. Heval Seyîd pir herikbar û bi tevger bû. Jiyan ti cara li gel heval Seyîd nedisekinî û pir jêhatî bû. Ew bîra civakê bû. Di Çapemeniya Azad de xwedî bîr û bawerî bû. Dijmin hewil dide ku bîr û mejiyê gelê Kurd vala bike û qir bike. Hevalê Seyîd li hemberî wê berxwedaniyek e mezin kar û xebatê rojnamevaniyê dida meşandin. Hertim dixwest ku dîrokê nas bike û bide naskirin jî. Ji ber wê diçû kîjan heremê erdnigariya li wir, gelê li wir de jîyan dike. bi hurgileyekê herî mezin lêkolîn dikir û di nîvîsand. Heval Seyîd fedekar bû û hevalên xwe hez dikir, xwe nêzî dilê mirovan dikir. Hevaltiya wî pir paqij û xwezayi bû. Heval Seyîd zarokê şoreşê bû û bixwe wek kesayet şoreş bû.”

### ‘Seyîd Evran mamosteyê jiyanê ji bû’

Stêrk Gulo axaftina xwe wiha berdewam kir: “Hevalê Seyîd Evran pişta xwe sipartibû çiyayên azad. Li her girê ku şopa gerîlayên azadîyê tê de berxwedanî pêşxisti be, pênûsa xwe tê hişti bû. Hevalê Seyîd ne tenê rojnamevan û şoreşger mamosteyê jîyanê bû. Heval Seyîd rastî di rûyê gerîla de dît. Heval Seyit pir hewil da ku Çapemenîya Azad pêş bikeve. Heval Seyit di rojnameya damizerandina rojnameya Polîtika Azad de cih girt. Ruxmê ku êrişa li ser navenda rojnameya Politikaya Azad de brindar jî dibe, gav di paş de na avêj e. Pîşeya heval Seyîd endazyarî bû, lê xwastek û pêşketina wî hemû kar û xebatê jiyanê da xwe dida pêş. Heval Seyit kesayetek ku hertim xwe zindî dikir û pêwajoyê de herdem guhartin ava dikir. Tevgera hevalê Seyit ya fizîkî derbas dikir. Enerjiya wî ya rih û fikrê wî bû. Hertim hest û fikrên azad jiyan dikir. Di her 4 parçeyên Kurdistanê de jî xebat kir. Başûrê Kurdistanê herêm bi herêm malbat bi malbat nas dikir. Di heman demê de li Rojavayê Kurdistanê bû pêşengekek şoreşê. Hevalê Seyîd ji gel hezdikir û li wan guhdar dikir û nîqaş dikir. Heval Seyîd stûnek ji çapemeniya azad bû. Hezaran şagirtên heval Seyîd bi kesayeta xwe û bi kar û xebatê xwe da avakirin.”

### ‘ Seyîd Evran: Dibe em rastiya şervanên azadiyê bi hemû cihanê bidin guhdarkirin’

Rojnamevan Stêrk Gulo biranînek xwe û Şehîd Seyit Evran dema bûyerek dişopandin got û wisa domand: “Di pêngava Şehîd Rûbar Qamişlo de em û hevalê Seyêd bi hevre wek rojnamevan dişopand. Baran dibarî û kamiraya heval şil dibû. Kamiraya ber baranê di parast û di got: ‘ Pêwiste ev kêliyên niha ev şervan û milîtanên Rêber Apo jiyan dikin, em bi hemû hurguliyên wê cihanê giştî bidin guhdar kirin.’ Ev di anî ser ziman ku ev hovitî û terora DAIŞ’ê wek zindî derxine pêşîya hemû cîhan ê. Pir qetliamên çeteyên kujer yên DAIŞ’ê bi wênekeş û kamiraya Seyit Evranhatine kişandin û temaşevanan we hate pêşandan. Hevalekê cesur û hertim dengê rasti û heqîqetê bû. Hevalê Seyit hemû erdngariya Rojavayê Kurdistanê geriya û nas-kir. Her gund û bajarên Rojavayê Kurdistanê geriya û gel ra nîqaş dikir. Zarokê 7 salî û heya kalê 70’ê salî heval Seyit nasdikir û lê hezdikir. Heval Seyit hertim hemberî neheqîyê tekoşîn dikir. Heval Seyit Evranji bona doza xwe amade bû her tişti bike.”

### ‘Heval Seyîd pir nifşên nû yê wek kesayeta Seyîd Evran dan avakirin’

Stêrk Gulo wiha axivtina xwe bi dawî kir: “Heval Seyit stûnek ji çapemeniya azad bû. Bi hezaran



şagirtên heval Seyit ava bûn. Heval Seyit gelek nifşên nû avakirin. Ciwanên Rojavayê Kurdistanê di beşa rojnamevaniyê de hevalê Seyit wek xetekê dibînin. Çêkirina nûçeyekê heya kişandina wêneyekê bi şêwaza heval Seyit Evrandikşînin. Endamên Ragihandina Azad, Dêrik heya Efrînê li ser şopa Seyit Evran, Gulistan Tara, Rizgar Adamiş û hwd. dimeşin. Heval Seyit hertim tîna ser ziman di got ‘ Ez şagirtê Gurbetlî Ersoz im.’ Kêlî bi kêlî rihê şehîdan re jiyan dikir û ji bona pêşxistina şoreşê her tim nav liv û tevgerê da bû. Em ti cara nahêlin ku pênûs û kamireya heval Seyit û hevalên doza pêşxistina Ragihandina Azad de şehid bûne erdê bimin e. Em hêz digirin ku me hevalên wek hevalê Seyit Evren re jiyan kiri ye. Bi mebesta salwegera şahadeta sala yekemîn de em wek rê hevalên wî yê Ragihandina Azad û tekoşînê, bi rêzdarî bibîrtînin û bejna xwe ditewînin.”

# ‘Armanc valakirina gundê Kaxirê bû’

**Şêniyan diyar kir ku sûcên li gundê Kaxirê hatine kirine beşeke biçûk a sûcên li herêmên dagirkirî ye û gotin çete bi van sûcan dixwazin gund vala bikin û malbatên xwe lê bi cih bikin.**

Efrîn ji sala 2018’an ve di bin dagirkeriya dewleta Tirk û çeteyên wê de ye û sûcên dermirovî, talankirin, wêrankirin û qirkirina xwezayê bê navber dewam dikin.

Çeteyên koma “El Emşat” di çarçoveyê binpêkirinên xwe yên li dijî şêniyan de, xerac li ser milkên şêniyên gundê Kaxirê yê bajarê Mabatayê ferz kir û xwestin mal û milkên wan bi zorê bistînin. Şêniyên ku xerac nedin jî ji aliyê çeteyan ve hatin revandin.

15’ê Îlonê gundiyên Kaxirê bi pêşengiya jinan xwepêşandan li dijî dagirkeriyê li dar xist. Gundiyan xwest xizmên wan ên revandî serbest werin berdan.

Çeteyên koma navborî êrişî xwepêşandana şêniyan kir. Bi piranî jin, nêzî 20 kes birîndar kirin. Piştre jî bi ser malan de girtin, gund dorpêç kir, înternet li ser gund qut kirin û çûn û hatin jî qedexe kirin.



Heysem Kerad



Mewlîda Abdullah Silêman

Rêxistina Mafên Mirovan a Efrîn-Sûriyeyê ragihand ku çeteyan ji bo rastiya bûyerên li gund berevajî bikin zor li birîndarên xwepêşandanê kir ku di dîmenan de bibêjin ku ew di encama pevçûnên malbatî de birîndar bûne.

Welatiyê bi navê Heysem Kerad ji gundê Kaxirê ye, ji ber dagirkirina gund 5 sal e li taxa Şêxmeqsûd a Helebê dimîne. Heysem Kerad anî ziman ku sûcên li dijî gundiyên Kaxirê hatine kirine beşek biçûk a sûcên li herêmên di bin dagirkeriya Tirk û çeteyên wê de ye.

Heysem Kerad diyar kir ku gundê Kaxirê yek ji 366 gundan e ku dewleta Tirk û çeteyên wê sûcan li dijî şênî û xwezaya dikin û wiha domand: “Çete zorê li xwediyên darên zeytûnê dikin ku li ser her darekê 8 dolar xerac bidin. Çete bi van siyasetên xwe yên giran armanc dikin ku gundiyên mane ji gund derxin.”

Heysem Kerad îşaret pê kir ku çeteyan xwestin êrişên xwe yên li ser xwepêşandêran û birîndarkirina hejmarek xwepêşandêr sûcên xwe veşêrin û got: “Nûçeyên derew belav kirin digotin ew kes di pevçûnên malbatî de birîndar bûne. Lê dîmen û wêneyên medyayên dîjîtal parve kirine îdiyên derewîn ên çeteyan piştrast kirin.”

Kerad bi bîr xist heya niha nikarin bi şêniyên gund re bikevin nava peywendiyan û wiha domand: “Ji bilî agahiyên ku çeteyan hebûna xwe li herêmê zêde kirine û operasyonên serdegirtina malan û kontrolkirina telefonên wan û qedexekirina gera li nava gund, em tiştekî din der barê gundiyan de nizanin.”

Heysem Kerad anî ziman ku serhildana jinan a li hemberî çete û dagirkeran cihê serferaziyê ye û bang li şêniyan kir ku serhildanê bidomînin.

Şêniya bi navê Mewlîda Abdullah Silêman anî ziman ku beriya bûyerên dawîn têkiliyên wê bi xizmên wê yên li gundê Kaxirê re hebûn û got: “Şêniyan ji ber pêkanînên dijwar ên çeteyan şîkayet dikirin. Şêniyan digotin, çete li beramberî hilbirînên wan miqdarên mezin ên pereyan distînin. Digot ew qas miqdar pere li cem wan in. Her wiha digotin, çeteyên Tirkiye dixwazin bi darê zorê me koçber bikin.”

Mewlîda da zanîn ku çete ji bo valakirina Kaxirê û bicihkirina malbatên xwe timî gefan li xizmên wê yên li gund dixwin. Her wiha diyar kir ku çeteyan ji bo ku binpêkirinên xwe binixumînin peywendî li ser gundê qut kirine û got, ew nikarin tu agahiyan ji xizmên xwe yên li gund wergirin.

Mewlîda berxwedana jinan a li hemberî çete û dagirkeran silav kir û bang li rêxistinên mafên mirovan kirin ku li hemberî pêkanînên li herêmên dagirkirî wezîfeyên xwe bi cih bînin. **ANHA**